



18 Hezîran 2020



© Diala Brisly
Brisly

**Daxuyaniya "Tevgera Malbatên Ji
"Bo Azadiyê
Derbarê Xanimên Ku Li Efrînê
Hatine Revandin**

Di 29ê Gulanê 2020 de, vîdyoyek li ser tora Internêta belav bû, ku ji hindirê navenda Koma El-Hemza ya girêdayî "Artêşa Niştîmanî ya Sûrî" ku Tirkîyê piştewaniya wê dike, li bajarê "Efrînê" yê di bin desthilata Tirkîyê de hatibû kişandin, dema ku hejmarek ji sivîlan û çekdaran êrîşî wê navendê kirin. Di vîdyoyê de diyar bû ku 8 xanim û zarokek

di wê navendê de girtî bûn. Sedema êrîşa li ser navendê jî ew bû, ku di 28ê Gulanê 2020 de, çekdarekî ji koma El-Hemza narincokê (bumbeyeke destan) avêtibû hindirê firoşgeheke koçberekî sivîl ji Xûta Rojhilat. Di encamê de du kesên sivîl, ku yek ji wan zarok bû hatin kuştin, û du kesên din jî birîdar bûn, ji lewre hejmarek ji niştewciyan derketin xwenîşandaneke li pêşiya navenda wê komê, û tê de doza radestkirina sûcdaran kirin, herwiha zêdegaviyên carandî yên çekdaran dermafê sivîlan şermezar kirin. Tevî ku di vîdyoyê de tê xuya kirin ku xanimên girtî têne rizgar kirin, lê cihê wan ta vê kêlikê ne diyare, ne jî navên wan û nasnameyên wan, û sedemên binçavkirina wan, bi ser de jî nûçene sawedar belav bûn, ku ew careke din hatine radest kirin bo koma El-Hemza ya naskirî bi encamdana bînpêkirinên bê ser û ber, ji dizînê, û revandinê, û kuştinê, û herwiha tirsandina sivîlan. Ji aliyekî din ve Navenda Belgekirina Bînpêkirinan Li Sûriyê di nûçeyê xwe de da zanîn ku ew xaniman bo Asayîşa Leşkerî hatine radest kirin. Di heman demê de, hin çalakvanan dikarîbûn ku navê didwan ji xanimên ku di wê vîdyoyê de diyarbûyî belge bikin, yek ji wan "Heyfa El-Casim" ji Efrînê ye, ku ji sala 2018an ve girtî ye, û ya din jî "Rûkan Menla" ji bajarokê "Ciwêq" e, ku ji Tîrmeha 2019an ve girtî ye, her li gor zanyariyên wan çalakvanan, û ev tê wateya ku bi kêmanî yek ji wan xaniman du salan di girtîgeheke komeke leşkerî de girtî maye, bê ku malbata wê ti zanyaryan ser cihê wê, sedemên girtina wê, û herwiha rewşa wê nas bikin. Em di "Tevgera Malbatên Ji Bo Azadiyê" de tengijîn ji dîmenên wan xaniman û zarokê ku di navendeke leşkerî de, di siya rewşeke ne layiqî rûmeta mirov de girtî bûn. Ji lewre em hewildanên Koma El-Hemza ji bo derxistina mehneyan di vê derbarê de şermezar dikin, ji ber ku nediyarkirina çarenivîs û nasnameya girtiyan tê wateya, ku malbatên wan nikarin pêwendiyê bi wan re bikin, ne jî karin ji wan re parêzer hêspar bikin, wiha ew ji dadmendiya bê par dimînin. Herwiha em reftarên cihêker ser bîngêhên nijadperestî an olî an herêmî an zayindî, ji çî hêlê ve bin, şermezar dikin. Herwiha em berpirsariya saxlemî û serbestberdana xanimên girtî dixin stuwê desthilatên heyî li Efrînê, û ser serê wan hêzên Tirkîyê, ku ew hêzên sereke ne di rêvebirina bajar de, û ji ber ku ger ne ji nermahiya Tirkîyê be, komên Artêşa Niştîmanî ya Sûrî, û Asayîşên Leşkerî û yên sivîl, nikarin bînpêkirinan û zêdegaviyên weke vê bikin. Binçavkirina 8 xaniman ne bûyera yekê ye, û ne jî ya bitenê ye li Efrînê, ku komên Artêşa Niştîmanî ya Sûrî, yên Tirkîyê piştewaniya wan dike, di heyama herdu salên buhurî de, û li pêş çavê Tirkîyê, her berdewamin di kiryarên girtinê û revandina bi neçarî dermafê sivîlan ji Ereban û Kurdan, li gor raporên hin rêxistinên mafnasî yên navdewletî, wekî Komîteya Navdewletî ya Serbixwe bo Lêkolînê Derbarê Sûriyê, û Rêxistina Lêborînê ya Navdewletî. Herwiha hin rêxistinên mafnasî yên Sûrî "Binçav kirina 506 kesan bi neçarî li Efrînê di heyama nivê duyem ji sala 2019an ve" belge kirin, û her tekez kirin ku "Ji destpêka sala 2020an ve, di nava windabûyan de li navçeya Efrînê, bi kêmanî 15 jin hene". Raporên rêxistinên mafnasî diyar dikin ku komên Artêşa Niştîmanî sivîlên girtî li navendên

xwe yê leşkerî, bi awayekî her wekî rêjîmê îşkence dikin, bi ser de jî dibêjin em şerê rêjîmê dikin, ev ji bilî karên revandinê û ferhodkirinê û xwestina peran ji girtiyan û malbatên wan beranberî serbestberdana wan.

Em di "Tevgera Malbatên Ji Bo Azadiyê" de û rêxistinên ku li ser vê daxuyaniyê îmze kirine, ji Desthilata Tirkîyê dixwazin ku bi lez tev bigere û fişarê li hêzên xwe û komên Artêşa Niştîmanî ya Sûrî û Asayîşa Leşkerî û ya Sivîl li bajarê Efrînê bike, her ji bo:

1. Eşkere kirina cihê xanimên girtî û diyar kirina nasnameyên wan, û serbestberdana wan di cî de.
2. Vekirina lêkolînekê derbarê sedemên girtina xaniman, û zelal kirina rewşa wan di heyama dema girtinê de, û siza kirina sûcdaran.
3. Serbestberdana tevahiya kesên ku di navendên komên leşkerî de girtî ne, nemaze jinan û zarokan, û siza kirina binpêkeran.
4. Rawestandina karên binçavkirinê li Efrînê bêyî ragirnameyeke fermî ji aliyên dadwerî yê pispore.
5. Rêgirtina li pêş rewşên girtinê yê bê dadgeh kirin.
6. Vekirina rê li pêş rêxistinên bê alîyane da ku derbasî tevahiya girtîgehan bibin, û rewşa mirovahî ya girtiyan, û bi taybet ya jinan bişopînin.
7. Zelal kirin û şirove kirina bingehe û yasayên ku girtin li gor wan tê encam dan, û belavkirina wan bi zimanekî zelal û têgihîştî bo tevahiya nişteciyên bajarê Efrînê.

Tevgera Malbatên Ji Bo Azadiyê daxwazê ji hemû rexistinên û desteyên mafnasî, yê navdewletî û xweçehî, û herwiha aliyên navdewletî yê xwedî bandor di doseya Sûriyê de dike, ku fişarê li Desthilata Tirkîyê bikin ji bo rawestandina binpêkirinên mafên mirov û girtinê li deverên jêr desthilata hêzên wê li Bakurê Sûriyê.

Peymankar:

1. Caesars Families Association
2. Syrians for Truth and Justice - STJ
3. Impunity Watch
4. Badael
5. Dawlaty
6. Urnammu
7. Syria Campaign
8. Release Me organization
9. Women Now for Development
10. Syrian league for Citizenship
11. Cairo Institute for Human Rights Studies (CIHRS)
12. Violations Documentation Center in northern Syria

سوريون
من أجل
الحقيقة
والعدالة

Syrians
For Truth
& Justice



History

Syrians for Truth and Justice was conceived during the participation of its co-founder in the Middle-East Partnership Initiative (MEPI) Leaders for Democracy Fellowship program, who was driven by a will to contribute to Syria's future. Starting as a humble project to tell the stories of Syrians experiencing enforced disappearances and torture, it grew into an established organisation committed to unveiling human rights violations of all sorts.

Convinced that the diversity that has historically defined Syria is a wealth, our team of researchers and volunteers works with dedication at uncovering human rights violations committed in Syria, in order to promote inclusiveness and ensure that all Syrians are represented, and their rights fulfilled.

-
- 🌐 www.stj-sy.org
 - 📘 [syriaSTJ](https://www.facebook.com/syriaSTJ)
 - 🐦 [@STJ_SYRIA_ENG](https://twitter.com/STJ_SYRIA_ENG)
 - 📷 [Syrians for Truth & Justice](https://www.instagram.com/Syrians_for_Truth_Justice)
 - ✉ editor@stj-sy.org